Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :969 | 8-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

## Jîmara 14'an ya Kovara Şermola derket

**Jimara 14'an ya Kovara Şermola ya Wêjeyî û Çandî bi zimanê kurdî û erebî li bakur û rojhilatê Sûriyê derket.**

Dosyaya hejmara nû ya kovarê "Êzîdî û Êzîdiyatî" ye, da ku rasteqîna vê pêkhateya ku li ser dirêjahiya sedsalên berê toşî paşguhkirin û dorpêçkirina rêbazkirî bûye werê eşkerekirin, hem jî erêkirina resenî û kevinahiya ola êzîdî û pê re gel, milet û baweriyên deverê.
Di hejmara 14'an de berhemên bi dehan nivîskar, rewşenbîr û lêkolînerên ji pêkhateyên cuda yên Sûriyeyê, hene. Beşên kovarê ev in: Analîzên hizrî, dosyaya hejmarê, lêkolîn, hevpeyivîn, nirxandina pirtûkan, werger, jin û çand, huner, çîrok, helbest, gotar û raporên wêjeyî. Hejmara 14'an a kovara Şermola 262 rûpel in, bi kurdî û erebî hatiye çapkirin.

Di civîna damezrîner a kovarê de ku di 24'ê Îlona 2018'an de li Qamişloyê hate avakirin, tê de gelek rewşenbîrên bakurê Sûriyê amade bûn. Tê de biryar hate dayîn ku kovareke wêjeyî û çandî li bakurê Sûriyê bi zimanên erebî û kurdî bi navê Şermola were derxistin.




***ANHA***

## Berlîn li hêviya filmên kurdî ye

**Festîvala Filmên Kurdî ya Berlînê îsal di navbera 13 û 19'ê Cotmehê de tê lidarxistin.**

Festîvala Filmên Kurdî ya Berlînê ji bo cara 12'an wê bê lidarxistin, ji bo wê jî haziriyên xwe dike. Festîvalê bi afîşa xwe ya nû ya îsal da xuyakirin ku wan malpera xwe ji bo miracaetên filman vekiriye û niha kesên bixwazin dikarin bi filmên xwe miracaetî festîvalê bikin.





Festîvala Filmên Kurdî ya Berlînê îsal di navbera 13 û 19'ê Cotmehê de tê lidarxistin.
Festîvalê fokusa xwe ya îsal jî weke "Rojava" diyar kiriye û dê berê xwe bide Rojava.
Ji bo miracaetên filman heta 15'ê Tebaxê wext heye.
Şert û mercên festîvalê wiha ne;
- Berhemên di sala 2021 û 2022'an de hatine hilberandin.
- Divê film ji 25 deqîqeyî dirêjtir nebin.

- Çîrokên bi nihêrîna Kurdan hatine vegotin yan jî çîrokên rasterast li ser Kurdan.
- Divê film li van festîvalan nehatibin nîşandan û xelat wernegiritibin ; Cannes, Berlinale, Venice, Locarno, Karlovy vary, San Sebastian.
- Li dawiya festîvalê, juriyeke azad wê biryarê li ser sê filman bide û xelatê bide van filmên hatine neqandin.
- Bihayê ji bo miracaeta filman 5 euro ye û li ser malpera film freeway mirov dikarin xwe bigihînin me.

***Ozgur Polîtîka***

## 'Lê menzereya wî cihî?'

**Hunermenda Fransî Estelle Chretien bi hin mudaxeleyan bala mirovan dibe ser xwezayê.**



Wê bi van xebat yan jî mudaxeleyên xwe yên hunerî, kiriye ku mirov bêhtir li ser xwezayê û bikaranîna wê bifikirin. Herî zêde jî balê dibe ser peywira daran û di xebateke xwe de cizmeya ku mirov dixin piyên xwe, di bin koka darekê de bi cih kiriye. Lê xebata wê ya ku erda qelişî bi ta û derziyê dirûtiye jî bi qasî darên bi cizme balê dibe ser xwe.

Estelle Chretien ji bo daran dibêje, "Dêwên ku li dinyayê dixebitin" û li gorî nihêrîna wê mirov bi her awayî xwe dikin xwediyê xwezayê û dema cihekî dikin malê xwe, êdî sînoran ava dikin. Li ser vê meseleyê jî ew pirseke wiha dike, "Temam erdê hûn lê dimînin ango mal û baxçên we milkên taybet in. Lê menzereya wî cihî?'

Estelle Chretien li gel ku pê bawer e, huner hin guhertinan çêdike jî, ew herî zêde bi hestên ku huner bi mirovan re çêdike re mijûl dibe û wê girîngitir dibîne. Wê jî bi van xebatên xwe vê hêvî kiriye ku mirov li ser hin meseleyan hestiyar bibin û bifirikin.

***Ozgur Polîtîka***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Bîrdozî | Nêrîna li cîhanê, nêrîna ramyarî, hizir û ramana siyasî, çandî û civakî. Îdeolojî: Bîrdoziyên dewletan ne ji bo civakan in. |
| Efser | Di leşkeriyê de kesên bipaye, kesên fermanan bidin. |
| Hişmendî | Zêhniyet, nêrîna mirov li xwaza, mirov, bûyer û cîhanê. |
| Semyan | Kesê/kesa xwedîtiyê li malbatê dike. |
| Sermiyan | Mal, milk, mita, kapîtal. |
| Seranser | Tev, ji serekî heta serê din: Ez li seranserê bajêr geriyam min nedît. |
| Seresere | Karê bê girîngî hatî kirin: Karê xwe seresere dike. |
| Serwer | Di malbatê de kesê guhê xwe dide dêvabên xwe û bi karê malê re eleqedar |
| Perestin | Di aliyê olî de îbadetkirina ji bo hebûnekê û baweriya pê. Hebandin. Weke pûtperest, çêlekperest, Xwedaperest... |
| Perestgeh | Ciyê perestinê, ciyê îbadet lê tê kirin. Weke mizgeft, dêr û hwd. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | E | Ş | ■ | N | Î | V | ■ | H |
| 2 | A | ■ | E | Y | A | R | ■ | T | O |
| 3 | ■ | A | V | ■ | Q | O | S | E | R |
| 4 | A | P | Î | K | O | ■ | S | ■ | Î |
| 5 | R | ■ | N | Î | S | K | ■ | B | ■ |
| 6 | D | A | ■ | N | ■ | A | K | A | M |
| 7 | ■ | R | E | ■ | Ê | D | Î | ■ | A |
| 8 | B | Î | S | O | K | Î | ■ | E | W |
| 9 | Z | ■ | A | X | ■ | N | A | M | E |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 2 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 3 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 4 | | | | ■ | | | | | |
| 5 | ■ | | | | | ■ | | | ■ |
| 6 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 7 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |
| 8 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 9 | ■ | | | | ■ | | | | |

**ÇEP-RAST**

1. Şîrê kelandî yê havêynkirî... Sala borî
2. Ne kevin... Tehm, lezet
3. Roja em tê de ne
4. Bêzar û bêziman... Mehek
5. Kinceke zivistanî ya stûr e û hetanî ser lingan dadikeve... Kar û xebat
6. Lehengê destana Newrozê... Rojek
7. Kurteya elementa Aktînyûmê... Notayek
8. Yezdanekî misrî... Mehek
9. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Aşît, şepe, berfende

**JOR-JÊR**

1. Hesinê ku li binê piyê hespan dixin... Kesê ku deng naçê, kesê ku guhê wî nabihîze
2. Pirç... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Tîpên navîn ê "saet"ê
3. Pêvek
4. Rengek... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?... Dengdêrên "pêça"yê
5. Kurtebêja otomobîlê... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin
6. Vê carê
7. Zanayê ku pêşerojê li gorî daneyên heyî texmîn dike, dûrebîn... Notayek
8. Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Cihê herandinê
9. Baneşana keserê... Kesê ku di meyxaneyê de meyê digerîne

## Şerê Zap û Avaşîn hunera şer ya gerîla ye



Hewl didin êrişên dagîrkeriyê yên ser başûrê Kurdistanê bi hemû hovîtiya xwe bidomînin. Operasyona leşkerî ya bi navê 'Pençe Kîlît' ji operasyonekê wêdetir, di çarçoveya şerekî navlênekirî de dewam dike. Ev şer ne pevçûneke 2 artêşên birêkûpêk e, ne jî şerekî klasîk e. Şerekî bêeman yê berxwedanê ye ku komeke gerîla li qadeke teng, li dijî artêşeke mezin ya dewleteke û destekdarên wê tê meşandin. ***R-4***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 969 | 8-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# HPG: PDK amadekariya tevlîbûna şer dike

**HPG'ê got, PDK xwe amade dike ku tevlî 'şerê dîrokî' yê navbera gelê Kurd û dagîrkeriya tirkî bibe. Herwiha bang li hêzên Kurdistanî kir ku erk û berpirsyariyên xwe pêk bînin û pêşî li êrişeke bi vî rengî bigirin.** R-2



## Êrişên dagîrkeriya tirkî li ser tevayiya gelên herêmê xeter in

Ehmed Yildirim: Bi êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê wê aramiya herêmê têk biçe, kirîza Sûriyê kûrtir bibe û çeteyên DAIŞê jinûve xwe xurt bikin. ***R-5***

## 'Xwendin nebe ti kes naçe pêş'

Evîn Teyfor: Jin niha dikare xwe bigihîne armanca xwe û bi azadî xwe pêş ve bibe. Weke Cegerxwîn jî gotiye, xwendin nebe ti kes naçe pêş, ava dibe pir derd û êş. Ez hêvîdar im çanda xwendinê di nava civakê de pêş bikeve. Bi xwendin û wêjeyê mirov pêş dikeve. ***R-7***



## Jinên Ereb yên HPC'ê: Li dijî Osmaniya Nû seferber bibin

Jinên Ereb yên HPC'ê teqez kirin ku armanca êrişên dewleta tirkî ya dagîrker avakirina Osmaniya Nû li ser hesabê destkeftiyên jinê û gelên herêmê ye. Herwisa bang li jinên Ereb kirin ku li hemberî van êrişan Parastina Rewa, Şerê Gel yê Şoreşgerî bikin bingeh û seferber bibin. ***R-2***

## `Îsal rewşa sewalkariyê ji sala borî baştir e`

Ji Rêveberiya Sewalkariyê ya herêma Cizîrê Dr. Rûken Şêxmûs da zanîn ku rewşa sewalkariyê ya îsal ji sala borî baştir e. Heriwha got, wek Rêveberiya Sewalkariyê em hewl didin bandora rewşa ziwabûnê ya li ser sewalkariyê sivik bikin û parastina sewalên li herêmê bikin. ***R-6***

**Diminatiya R. Erdogan ya Rojava**
Ahmet Aktaş
***R-6***



**Serkeftina me têkçûna projeyên wan e!**
Dilyar Cizîrî
***R-4***



**Dema dersdayîna dagîrker û qirkeran e.**
Zekî Bedran
***R-5***

# Jinên Ereb yên HPC'ê: Li dijî Osmaniya Nû seferber bibin

Jinên Ereb yên HPC'ê teqez kirin ku armanca êrişên dewleta tirkî ya dagîrker avakirina Osmaniya Nû li ser hesabê destkeftiyên jinê û gelên herêmê ye. Herwisa bang li jinên Ereb kirin ku li hemberî van êrişan Parastina Rewa, Şerê Gel yê Şoreşgerî bikin bingeh û seferber bibin.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Têkildarî êrişên dewleta tirkî ya dagîker û gefên Erdogan, Endama Hêzên Parastina Civakê-Jin (HPC JIN) Xewla Xelîl Mûsa, herwiha li ser pêwîstiya Xweparstina Rewa, Şerê Gel ê Şoreşgerî û rola jinê di vî şerî de Şemsa Ahmed Xelef Endama Hêzên Parastina Civakê-jin ya Ereb ji me re axivî.



**`Osmaniya Nû tinekirina hebûn û hêza jinê dike amanc`**

Xewla Xelil, bal kişand ser girîngiya parastina rewa ya jin li dijî êrişên dagirkerî û ev nirxandin kir: "Ji destpêka şoreşê ve jina Ereb bi erk û rola xwe rabûn û li kêleka hêzên xwe yên lêşkerî rola xwe di şoreşê de lîst. Ji 7 salî ve heta heştê salê em tev geriyan .Li ser bingeha xweparastinê jinê destkeftî bi destxistin û me civak ji çeteyan parast. Jixwe xwe parstin, mafê me yê rewa ye. Me teqez kir ku jin dikare xwebixwe biparêze û bibe xwediya hebûna civaka xwe. Li ser vî bingehê, jina Ereb bi felsefeya Rêber Apo bû hêza xwe û civakê."

Xewla teqez kir ku ev êrişên ser herêmê bakur û rojhilat Sûriyê li dijî şoreş û hebûna jinê ne û axaftina xwe wiha domand: "Jinan hêzeke mezin afirand û em ji dewleta tirkî ya dagîker re bûn tirs. Ji ber ku dewleta tirkî bingeha hişmendiya mêr ya desthiltadar temsîl dike. Li ser vî bingehî jî jinê her tim xwebirêxistin kir û hêza xwe mezintir kir. Ev êriş jî teybet li ser tekoşina azadiya jinê ne.

**'Li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî divê her jinek li dijî dagirkeriyê xwedî çek be'**

Endama Hêzên Parastina Civakê-Jin (HPC JIN) Xewla Xelîl Mûsa banga jinên ereb kir ku ji bo hebûna azadiya xwe li dijî dagirkeriya tirk xwe bi rêxistin bikin û axiftina xwe wiha bi dawî kir: "Ez bang li tevyiya jinan bi taybetî jinên Ereb dikim ku li ser bingeha Xweparstina Rewa û Şerê gel ê Şoreşger tev bigerin û çeka xwe ya fikrî û ya leşkerî ji xwe kêm nekin. Bi her awayî dewleta tirkî ya dagîker dixwaze me qir bike û jinê tine bike. Ji ber ku li hemberî vê pêvajoya û qirkirinê, riya yekan e ya jinê û tevayiya gelan, xwe parastine. Jixwe emê hêza xwe nespêrin hêza ti dewlet û hêzên".

**`Jina Ereb û Gelên herêmê li hemberî êrişan serfer bibin`**

Şemsa Ahmed Xelef Endama Hêzên Parastina Civakê-jin ya Ereb jî wiha axivî ":Me jinên Ereb di vê şoreşê de xwe naskir û em bûna xwediyê hêz û hebûna xwe. Erdogan îro dixwaze projeya xwe ya nû li ser tinekirina jinê û qirkirina gelan û bi dagîrkeriyê ava bike. Jin û



gelê Ereb vê yekê dizane ku gelê Ereb, Sûriyan û Kurd armanca qirkirna wê ne. Jixwe Hêzên navneteweyî jî bêdengin û ev qirkirine ji Erdogan re erê kirine. Îro ji me re ev pêvajo, pêvajoya Hebûn û Tinebûnê ye. Ji ber wê jî divê em serferber bibin û Şerê Gelê Şoreşgerî bikin bingeh û li hemberî êrişan xwedî sekneke dîrokî bin û herêmên xwe yên dagîkerî jî rizgar bikin."

# Festîvala Yekê ya Jinan Ya Şehîd Sema li Goteborgê pêk hat

**Festîvala Yekê ya Jinan ya Şehîd Sema (Fatoş Saglamgoz) li bajarê Goteborg yê Swêdê bi coşeke mezin pêk hat.**

Jinên Kurd ên li welatên Skandînavyayê, li 1'emîn Festîvala Jinan a Şehîd Sema (Fatoş Saylamgotz) li hev civiyan.

Festîval 5'ê Hezîranê li bajarê Goteborg ê Swêdê bi dirûşma "Li ber xwe bide, xwe bi rêxistin bike û bi rengekî azad bijî" hate lidarxistin.

Fetîvala ku ji aliyê Yekîtiya Jinên Kurd a li Skandînavyayê (YJK-Skandînavya) ve hate organîzekirin, li meydana Gûstav Adolfstorgê Pêk hat û jinên ji gelek neteweyên cuda jî tevlî bûn.

Li gel stranan di festîvalê de peyamên ji bo yekîtiyê û birêxistinkirina jinan hatin dayin.

Di festîvalê de defîleya ji cil û bergên Kurdî hate nîşandan û gelekî bal kişand.
Hunermend Çopî Fetah, Evîn Akbaş, Ozan Fîgen, Girîn Cizîrî, Koma Govendê ya Keçên Rojava, Koma Defê



ya Hejîn (Jinên Rojhilatî), Koma Folklorê ya Hindî (The third eye) derketin ser dikê û hunera xwe pêşkêş kirin.

Li qada festîvalê gelek standên ji xwarinên Kurdî jî hatin danîn.

Di festîvalê de ku bi coşeke mezin derbas bû, berxwedana jinan a li hemberî faşîzma li Tirkiyeyê hate silavkirin.
***ANF***

# KJAR: Di nava 3 salan de 410 jin hatin kuştin

**Komîteya Lêkolînê KJAR'ê derbarê kuştina jinan ya li Rojhialtê Kurdistanê de raporek weşand. Di raporê de hat gotin ku di nava 3 salên dawî de 410 jin hatine kuştin.**

Komîteya Lêkolînê ya Komelga Jinên Azad yên Rojhilatê Kurdistanê (KJAR) der barê qetilkirina jinan a li Rojhilatê Kurdistanê de raporek belav kir. KJAR'ê di raporê de diyar kir ku di 3 salên dawî de li Rojhilatê Kurdistanê 410 jin hatin qetilkirin. KJAR'ê anî ziman ku di destpêka sala 2022'an de jî 7 jin hatine qetilkirin.

Komîteya Lêkolînê ya KJAR'ê ragihand ku bi rêya weşandina vê raporê hewil didin ku aliyê tarî û xerab ê hişmendiya mêrsalariyê li gel qanûnê eşkere bikin û di heman demê de rêya çareseriyê ji bo rewşa heye bibînin.

Li gorî rapora KJAR'ê li herêmên cuda yên Rojhilatê Kurdistanê di nava sê salên borî de heta destpêka îsal wiha ye:

"Di sala 2019'an de 133 jinan dawî li jiyana xwe anîne û herî kêm jî 33 jin ji aliyê endamên malbatê û xizmên xwe ve hatine qetilkirin. 5 ji van bi îdiaya namûsê hatine qetilkirin.
Di sala 2020'an de, li gorî rapora Tora Mafên Mirovan, 94 jin li herêmên Rojhilatê Kurdistanê dawî li jiyana xwe anîne ku 33 kes ji van temenê wan li jêr 18 saliyê bûn. 18 jinên din ji aliyê endamekî malbatê weke bira, bav an hevjîn bi hinceta namûsê yan jî pirsgirêka civakî hatine qetilkirin.



Di sala 2021'an de, herî kêm 94 jinan dawî li jiyana xwe anîne ku ji van 15 kes kêmî 18 saliyê ne. 18 jin bi hinceta namûsê hatine qetilkirin, 17 jin jî bi destê hevjînê xwe hatine qetilkirin. 3 jin jî ji aliyê hevjînên xwe yên berê ve hatine qetilkirin.
Li gorî raporê, destpêka sala 2022'yan, 7 jin li Rojhilatê Kurdistanê bi hincetên cuda hatine qetilkirin."

Di dawiya raporê KJAR'ê wiha got: "Em weke KJAR'ê hewl didin ku rêya çareseriyê ji bo rewşa xerab a jinên herêmên Rojhilatê Kurdistanê bibînin. Dixwazin hemû jinan perwerde bikin û peywendiyan li gel jinan bikin. Daxwazê ji jinan dikin ku peywendiyê bi me re danin."
***ANHA***



# 'Xwendin nebe ti kes naçe pêş'

Evîn Teyfor: Jin niha dikare xwe bigihîne armanca xwe û bi azadî xwe pêş ve bibe. Weke Cegerxwîn jî gotiye, xwendin nebe ti kes naçe pêş, ava dibe pir derd û êş. Ez hêvîdar im çanda xwendinê di nava civakê de pêş bikeve. Bi xwendin û wêjeyê mirov pêş dikeve.

Her çiqas Wêjeya Kurdî nebûye wêjeya desthilatdariyê, lê ji ber dewlemendiya xwe bandorek mezin a baş di Rojhilata Navî û cîhanê de pêk aniye. Jin jî roleke girîng di bipêşketina wêjeyê de girtine. Evîn Teyfor girîngî û bipêşketina jinê ya di Wêjeya Kurdî de nirxand. Evînê di destpêka axaftina xwe de anî ziman ku ev 5-6 sal in wê dest bi xebatên nivîs û wêjeyê kiriye û wiha peyivî: "Ez niha li Peymangeha Şehîd Zozan mamostetiyê dikim. Ev nû ye ku ji bo xebatên amadekirina kovarekê ez hatime zanîngehê. Her wiha di wergerê de li vê derê dixebitim, ez a niha li Zanîngeha Wêjeyê dixwînim jî. Ez dikarim bibêjim, ev 5-6 sal in min dest bi xebata nivîsê û wêjeyê kiriye. Xebatên min bêhtir di warê wêjeyê de ne. A niha 2 heb pirtûkên min li ber çapê ne. Pirtûka min a yekem 'Saeta Çîrokên Zarokan' e. Di wê pirtûkê de şeş çîrok hene. Ya din jî bi navê 'Lekeya Tirsê' ye. Di vê pirtûkê de jî 12 çîrok hene."

**'Ez ê romanan bi Kurdî bixwînim'**

Evînê bal bire ser wê yekê ku wê kengî û kîjan salê dest bi xebatên xwe yên di milê wêje û nivîsê de kiriye û got, "Min sala 2016'an dest bi xebatê kir. Ez 14 salî bûm, wê demê min dest bi xwendina romanan kir. Ev jî bi piştgiriya xwişka min a mezin bû. Wê jî Beşa Dîrokê di Zanîngeha Helebê de dixwend. Min her car didît ew diçe zanîngehê. Wê demê xewn û xeyalên min ji bo xwendinê mezin dibûn. Her wiha hezkirina min ji bo xwendina pirtûkan her ku diçû bi hêztir dibû. Piştî temenê 14 salî, ez dikarim bibêjim ku êdî min dikaribû hinekî bixwenda. Belkî hinekî lawaziya min a ziman û wêjeyê hebû. Lê ez gelekî xebitîm ji bo ku bi pêş bikevim. Her wiha wê demê min dest bi xwendina pirtûkên Erebî kir. Yanî ji wê demê heta niha, hema hema min 2200 pirtûk xwendine. Min hem bi zimanê Kurdî hem jî bi zimanê Erebî xwendin. Piştî ku min Peymangeya Şehîd Gîvara Dalî xwend,



wê demê min biryar stend ku ji nû ve fêrî zimanê Kurdî bibim. Êdî min got ez ê romanan bi zimanê Kurdî bixwînim."

**Mamostetiya wêjeya Kurdî dike**

Evînê weke jineke ciwan li hember zehmetiyan gavên serketî avêtine û lin ser wan ew dibêje, "Min di destpêkê de gelek zehmetî ji aliyê têgehan ve didîtin. Min rojane deh kêliyan dixwend. Êdî min nikaribû xwendina bi Kurdî temam bikira. Ji ber ku mirov destpêkê zorê dibîne, lê pişt re li pey xwe dihêle. Lê hema piştî salekê ez hinekî li xwe vegeriyam. Min dît ku asta min ji berê baştir bûye. Yanî min dît, li gorî rewşa min a berê ez pirr pêşketî me. Piştî wê demê min êdî dest bi xwedina helbest û çîrokên Kurdî kir. Di Peymangeha Şehîd Zozan de min dest bi mamostetiya Wêjeya Kurdî kir. Li vir, ez beşdarî xebatên pêşbirk û kovaran bûm. Ez di asta sêyemîn a pêşbirka ciwanan de bi ser ketim. Her wiha di pêşbirka Şehîd Viyan a Çîrokan de bi ser ketim."

**'Derbarê zarokan de lêkolînên min hene'**

Evînê di dirêjahiya axaftina xwe de da xuyakirin ku wê di xebatên kovarên Destan, Şermon û Ekolojiyê de cih girtiye û wiha pê de çû: "Par Zanîngeheke Online hat vekirin, bi pêşengiya Dr. Seydo Aydogan. Di vir de ez fêrî rêbazê lêkolînê bûm. Çawa bi awayekî zanistî lêkolînê bikim, li ser vê sekinîm. Min di wê demê de biryar da ka çawa di milê lêkolînan de xwe xurt bikim û bi ser bikevim. Min dest bi lêkolînan kir, lêkolîna min a yekem li ser çîrokên zarokan bû. Piştî wê di Kovara Zanistî de hate belavkirin, jixwe ji aliyê kovaran de bi giştî navê min hatiye pejirandin. Niha lêkolînên min ên derbarê zarokan de hene. Her wiha min li ser zimannasiyê û klasîkê jî lêkolîn amede kirine. Niha jî ez li Zanîngeha Kobanê beşa Ziman û Wêjeyê dixwînim. Tevî vê xebata min û keda min dîsa jî ez nikarim ji xwe re bêjim, nivîskar. Ji ber ku hîn gelek mijar hene ku bi wan dakevim û wan zêdetir nas bikim."

**'Xwendin û wêje mirov bi pêş dixe'**

Evînê diyar kir ku bi rêya xwendin û wêjeyê, mirov bi pêş dikeve û gotinên wiha bi dawî kirin: "Em niha dinihêrin, jinê parastina zimanê xwe kiriye. Ruxmî ewqas zehmetî jî dîsa sînor li pêşiya xwe danenîne. Negotine, em nikarin li ber xwe bidin. Jin niha dikare xwe bigihijîne armanca xwe û bi azadî xwe bi pêş ve bibe. Weke Cegerxwîn jî gotiye, xwendin nebe kes naçe pêş, ava dibe pir derd û êş. Ez hêvîdar im çanda xwendinê di nava civakê de pêş bikeve. Bi rêya xwendin û wêjeyê mirov pêş dikeve."
***JINNEWS***

# Gonuldaş: Ziman parçe nake, digihîne hev

**Rêveberê Komeleya Çand, Huner û Ziman ya Anka Mehmet Zekî Gonuldaş qedexeyên dewleta Tirkan yên li ser çand û zimanêw Kurdî weke nîşaneya pratîka mejiyê inkarê pênase kir û diyar kir ku ziman civakan, gelan yan jî dewletan parçe nake, digihîne hev.**

Rêveberê Komeleya Çand, Huner û Ziman a Anka Mehmet Zekî Gonuldaş têkildarî zext, asîmîlasyon û qedexeyên li Kurdî têne ferzkirin ji ANF'ê re axivî. Gonuldaş got, "Ziman bîra civakekê ye" û wiha dewam kir, "Rêbaza tunekirina gelekî înkarkirin û asîmîlekirina çand û zimanê wî gelî ye. Mîna ku di xala 42'an a Destûra Bingehîn de tê gotin; Li Tirkiyeyê ji bilî Tirkî ti ziman nikare bibe zimanê perwerdeyê. Kurd tevî ku hêmanê esasî yê vî welatî ye, tevî rabirdûya xwe ya ji sed salî jî nikarin ji aliyê ziman û çandî ve xwe îfade bikin, zimanê wan nikare bibe zimanê perwerdeyê. Ne tenê zimanê Kurdî, ti ji zimanên gelên cografya Anatoliyê weke zimanê perwerdeyê nayê qebûlkirin. Kurd li vê erdnîgariyê ji aliyê hejmarî ve ji hindikahiyên din zêdetir e. Lewma daxwaza perwerdeya bi zimanê xwe dikin, lê dewlet vê daxwazê bi cih nîne."

**Li gel asîmîlasyonê jî xwedî li kurdî derdikevin**

Gonuldaş destnîşan kir ku Kurdî li gel asîmîlasyonê jî dewam dike, xwedî lê tê derketin û got, "Tevî qedexe, asîmîlasyonê jî ev ziman di stran, muzîk, şano, yanî ji aliyê çançdî ve dewam kiriye, tê dewamkirin. Lê belê ev polîtîkaya qedexe û asîmîlasyonê dewam bike dibe ku tune bibe. Li tevahiya cîhanê bi taybetî li Eworpayê gel hemû xwedî mafê perwerdeya bi zimanê xwe ne. Ev cihêrengî ye, dewletê yan jî civakê parçe nake. Rewşeke welê ye ku jiyana hevpar a gelan misoger dike û dewlemendiya çandî ye."

**Nêzîkatiya sed salî dewam dike**

Gonuldaş bal kişand ser qedexekirina konser, lîstik û şano yên Kurdî û zextên li ser zimanê Kurdî wiha nirxand: "Nêzîkatiya rojên dawî ya li zimanê Kurdî nîşaneya pratîka mejiyê înkarê ye. Bi saya taybetmendiya civakî ya Kkurdan zimanê Kurdî li gel înkarê jî gihîştiye vê astê. Li gundên dûr ên ku kapîtalîzmê nekarî xwe bigihînê ev ziman û çand jiya ye. Bi bajarîbûnê re ji ber ku di nava çand, perwerdeya serwer û zimanê hilberînê de nîne, asîmîlasyonê bêhtir xwe nîşan daye. Ev nêzîkatî sed sal in hîn jî dewam dike. Bi axaftina bi zimanê dayikê, bi muzîk, çand û hunera bi zimanê dayikê dewletek parçe nabe."

**Wê bi kirmanckî û soranî jî hebe**

Mehmet Zekî Gonuldaş li ser Komeleya Çand, Huner û Ziman a Anka ku wê 12'ê Hezîranê li Enqereyê



dest bi kar bike, wiha axivî: "Li Enqereyê nêzî heft sal in li ser vê bingehê karek nehate kirin. Berê komeleyek hebû ku karê ziman dikir, lê belê hate girtin. Bi zaravayên din ên Kurdî bi Kirmanckî, Soranî jî wê perwerdeyên me hebin. Çalakiyên çand û hunerî jî wê werin lidarxistin. Em ê li vê xakê karên çandî, çalakî û komxebatan lidar bixin."
***ANF***

# `Îsal rewşa sewalkariyê ji sala borî baştir e`

Ji Rêveberiya Sewalkariyê ya herêma Cizîrê Dr. Rûken Şêxmûs da zanîn ku rewşa sewalkariyê ya îsal ji sala borî baştir e. Heriwha got, wek Rêveberiya Sewalkariyê em hewl didin bandora rewşa ziwabûnê ya li ser sewalkariyê sivik bikin û parastina sewalên li herêmê bikin.

Darîn SilêQamişlo

Sewalkarî beşeke bingehî ji beşên aboriya herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Çimkî herêm ji aliyê sewalkariyê ve dewlemend e. Herwiha jêdera sereke ye, ya ku sewalvan debara xwe pê dikin. Lê di van salên dawî de ji ber guherîna hewayê û nebarîna baranê bandor li rewşa sewlan hatiye kirin. Gelek sewal ji ber vê yekê mirin û yên mayîn jî bi erzanî dihatin firotin. Ji bo çareserkirin û pêşîgirtina li vê rewşê rêveberiya sewalan ya herêm Cizîrê hewl dide sewalên herêmê biparêze û êm ji wan re peyda bike.

Li ser rewşa sewalkariyê ya herêma Cizîrê, serjimariya sewalan ya îsal û hewldanên rêveberiya sewalkariyê ji bo parastina sewlan, ji Rêvebera Sewlkariyê ya herêma Cizîrê Dr. Rûken Şêxmûs



ji me re axivî û nêrîna xwe ji me re anî ziman.

### `Rewşa sewalkariyê û hewldanên rêveberiyê`

Rûken Şêxmûs da zanîn ku ji ber guherîna rewşa hewayê û nebarîna baranê, du sal in rewşa sewalan ketiye xeterê û axaftina xwe wiha domand: “Her kes dizane dema baran kêm dibare, rewşa hewayê tê guhertin û zevî tev ziwa û hişk dibin. Li herêma me jî du sal in baran baş nayê, ev rewş bandorê li çandinî û sewalkariyê pir dike. Li kêleka wê êmê sewlan pir biha dibe. Ev jî dibe sedem ku gelek sewalvan sewlên xwe bi nirxekî kêm bifroşin, hin ji wan jî ji bo ku karibin êm ji sewalên xwe re peyda bikin nîvê wan bidin firotin, da ku êm ji nîvê mayî re peyda bikin. Wek rêveberiya sewalan em salan e sewalên li herêmê bi giştî vaksîn dikin, ev alîkariya sewalan dike ku karibin di vê rewşê de bijîn. Herwiha dema nexweşî bi sewalan re çêdibe, komîteyên me sewalên nexweş venêrîn dikin.”

### `Ji bilî rewşa ziwabûnê bandora şerê jî li ser sewalan heye`

Rûken behsa cudahiya navbera salên çûyîn û îsal de kir û wiha got: “Jimara sewalan ya salên 2018`an, 2019`an ji 2022`yan baştir bû. Îsal jimar pir kêm e, çimkî du sal in rewşa hewayê wiha ye û baran baş nabare. Sala çûyî rewş pir xirab bû û baran bi derbê de nehat. Îsal jî baran dereng hat, lê rewşa sewalan ji sala çûyî baştir e û êm jî peyda dibe. Par êm tinebû û pir biha bû. Ji bilî rewşa hewayê, rewşa dagîrkerî û şer jî bandorê li sewalan kir, çimkî gelek sewal di şer de, dema ku ji herêma xwe dihatin herêmeke din di rê de dimirin. Ev tev dibe sedema ku sewal li herêmê kêm bibin.”

### `Serjimariya sewalan ya îsal`

Rûken ji bo serjimariya sewêlan ya îsal li herêma Cizîrê got, îsal jimara çêlekan 56 hezar û 90 serî ye, pez 4 milyon û 500, bizin 39 hezar û 661, deve 4 hezar û 525, hesp 7 hezar 86 û yê gamîşan jî 3 hezar û 250 serî ye.

Rûken diyar kir ku wan îsal du caran êm li sewalan belav kir û wiha pê da çû: “Ji bo her serî çêlek gamêş û deve, di her carê de 50 kîlo dihat dayîn, ji bo sewalên piçûk jî 10 kîlo hat dayîn. Her şeş heyvan êm tê belavkirin. Ev miqdar têra sewalan nake, pêwîst e em her du heyvan carekê belav bikin. Lê ji ber êm li herêma me pir kêm e em neçar dibûn her şeş heyvan belav bikin. Em hewl didin di dema pêş de her du heyvan êm belv bikin, da ku têra sewalan bike û sewalvan jî zehmetiyn di peydekirina êmê sewalên xwe de nekşînin. Heriwha proje û palnên me yên ji bo peydekirina êm hene.”



Sewalvanê bi navê Delîl Mûnîr yê ji gundê Topis yê girêdayî bajarê Qamişlo, ku 20 sal in sewalan xwedî dike, derbarê mijarê de wiha axivî: “Ez 65 serî mî xwedî dikim. Ev du sal in ji ber nebarîna baranê em astengiyan di xwedîkirina sewalên xwe de dibînin û sehmetiyan di peydekirna êmê wan de dikşînin. Êmê ku rêveberiya sewalan daye pir kêm e têra sewalan ji bo heyvekê nake. Du sal in em zevî ji cotkaran dikirin da ku sewalên me jê biçêrin. Em ji niha ve haziriyên dema çile dikin û êm peyda dikin. Rast e ez xisarê pir dibînim, lê pezê min li ser dilê min pir şêrîne û nikarim dev ji wan berdim.”

Delîl got, xwedîkirina sewalan pir girîng e. Çimkî berhemên sewalan yên wek penêr, mast, şîr û her



wekî din hene. Eger sewal nemînin xwerekên bingehî jî namînin. Çiqas mirov li sewalên xwe xwedî derdikeve ewqas berheemê baş ji wan digire.

Sewalvan Delîl Mûnîr di dawiya axaftina xwe de bang li rêveberiya sewalkariyê kir ku, alîkariyê bide sewalên herêmê. Çimkî sewal ji vir qut bibin, wê bandoreke neynî li herêmê bê kirin.



## Dijminatiya R. Erdogan ya Rojava

**Ahmet AKTAŞ**

Weke tê zanîn, Rêveberiya R.T.Erdogan, ji bo êrîşî her devera Kurdistanê bike, ji xwe re sedem peyda kiriye yan afirandiye. Bi taybetî dema dixwest êrîşî Rojava bike, li hucetan/egeran digeriya, serokê MITê yê istixbarata wî Hakan Fidan, gotibû; “begê mîn, qet vî tîştî ji xwe re neke xem, emê derbasî binxetê bibin, li wir çend gule û topan bavêjin serxetê, emê bixin stikura PKK, PYD û hwd. û êdî em dikarin bi hêsanî êrîşên xwe yên dagîrkirinê bidin despêkirin”!

Wisa jî kirin û ewqas êrîş û ewqas dagîrkerî hemû li ser vê propaganda derewîn pêk anîn.

Îcar niha dîsa dest bi wê derewê kiriye û dibêje “emê bi tevgêrên (êrîşên) nuh him kêmesiyên xwe yên ewlekariya sînorê xwe yê Başûr temam bikin, him jî emê hemû hêzên xwe yên erdî, deryayî û ezmanî, ji bo her cûre peywiran amade bikin”

Bi kurtî armanca vê sextekariyê, bi navê parastina ewlekariyê êrîşeke nuh dest pê bike!

Jixwe heta niha li hemû cihên ku dagîr kiribûn, her cure amadekariyên van cih û waran bixe nava xaka Tirkiyeyê, pêk anîye. Jiyana civakî bi giştî li goreyî pergala dewleta Tirkan saz kiriye.

Niha jî, dixwaze ji vê alozî, mij û dûxana ku bi şerê Ukraynayê gurtir bûye, sûdê bigire û heke roniya kesk ji aliyê Rûsya û DYAyê ve standibe an bistîne, bê rawestan êrîş dike, li Rojavayê herêmên dagîrkirî zêdetir dike.

Li hundir çendîn cih lê teng bûye û ji her aliyê civakî û siyasî ve ketiye nava aloziyê û roj bi roj ber bi qeyran û kaosê ve diçe, li ber çava ne.

Erê, ji hundir ve, tirsa rêveberiya AKP-MHPê ji dijberiya CHP-IYI`yê nîne, berovajî vê, bi gelemperî xizmetê ji temendirêjiya desthilatiya AKP-MHPê re dikin.

Lê belê tirsa vê rêveberiya zalim û faşîst, gelek ji dijberiya hêza potansiyel a bi giştî ya gelê Tirkiyeyê û bi taybetî jî, ji Tevgêra Gelê Kurdistanê heye.

Jixwe niha vê rêveberiya qirker û dagirker, hemû giraniya êrîşên xwe daye ser Tevgêra Azadiya Kurdistanê û dijberiya gelê Kurdistanê. Lewma ewqas li gel xiyaneta PDK`ê peywendî û hevalbendiya xwe bi hêztir û leztir dike. Lewma hema bi çar çavan bendewarê derketina derfeteke ji derve ya rohniya kesk a hêzên hegemonên cîhanî ye.

Di encamê de divê mirov li beramberê vê pêngava gef û derewan a dawî ya R.Erdogan û Bahçelî reşbînî nebe. Jixwe yek ji armanca van gef û propagandayên tûj jî, afirandina xof û tirsê ye. Herwiha di vê gefa wî de jî, bi afirandina tirsê re, dixwaze gelên herêmên Kobanê, Minbic, Til Rifat, Şehba û eger derfetê bi dest xwe bixe, hemû Rojava çol bike, gel benaber bike; ji gelê xwecî û bi taybetî ji gelê Kurd xalî bike.

Bi vê re jî ranaweste, dixwaze gava dudan jî bavêje, ev jî; li şûna gelê xwecî û nexasim gelê Kurd kes û malbatên derve, yên ereb û hwd. bi taybetî yên ne Kurd bi cih bike.

Lê heta niha bi piranî li Tirkiyeyê, Bakur Başûr û Rojava nerazîbûn û dijberiya gel dihat zanîn û xuyabûn. Belê niha êdî ew malbatên ku li wan cih û warên dagirkirî jî, êdî serî hildan e û nerazîbûna xwe ya li dijî Tirkiyeyê nîşan didin.

Wê dirûşma “Sûriye Hurra Hurra, Tirkiye Itla-I Berra” nîşana ku êdî siyaseta dewleta Tirkan li wê herêmê nayê pejirandin! Ji bo man û nemana serweriya dewleta Tirkan ev ne elametên xêrê ne!



# HPG: PDK amadekariya tevlîbûna şer dike

HPG`ê got, PDK xwe amade dike ku tevlî şerê dîrokî yê navbera gelê Kurd û dagîrkeriya tirkî bibe. Herwiha bang li hêzên Kurdistanî kir ku erk û berpirsyariyên xwe pêk bînin û pêşî li êrişeke bi vî rengî bigirin.

Navenda Nûçeyan

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyekê ev hişyarî da: “Li gorî daxuyaniya rayedarekî PDK'ê ku bi navê Alîkarê Wezîrê Pêşmergeyan axivî, daxuyaniya Waliyê Duhokê û li gorî hin agahiyên îstîxbaratî yên gihîştine ber destê me, hêzên PDK'ê amadekariyê dikin ku dest li vî şerê stratejîk ê navbera me û dewleta Tirkan werde.”

### Şerê ji avaşînê heta Metîna

Daxuyaniya HPG'ê wiha ye: “Tê zanîn ku ji Avaşîn heta Metînayê li qadeke berfireh em bi dewleta Tirk a dagirker re di nava şerekî giran de ne. Bi taybetî ji 25'ê Gulanê û vir ve li aliyê girê Metîna-Amedîyê di navbera hêzên me û artêşa Tirk a faşîst mêtinger de şerekî mezin diqewime. Dewleta Tirk li hemberî hêzên me teknîka serdemê û çekên kîmyewî yên qedexekirî bi kar tîne û tevî vê yekê jî xitimî ye, nikare bi pêş ve biçe.

### PDK amadekariyan dike ku tevlî şer bibe

Ev şer di navbera gelê Kurd û dagirkeriya Tirk de şerekî gelekî dîrokî ye. Lê belê li gorî daxuyaniya rayedarekî PDK'ê ku bi navê Alîkarê Wezîrê Pêşmergeyan axivî, daxuyaniya Waliyê Duhokê û li gorî hin agahiyên îstîxbaratî yên gihîştine ber destê me, hêzên PDK'ê amadekariyan dike ku dest li vî şerê stratejîk ê navbera me û dewleta Tirk werde. Li bakurê Metînayê di navbera hêzên me û dewleta Tirk de şer diqewime. Li rojhilatê Metînayê jî şerekî gelekî giran dewam dike. Dema ku hêzên PDK'ê aliyê başûr ê Metînayê bigire, hingî plana dorpêçkirin û îmhakirinê ya dewleta Tirk wê temam bibe, ku li ser hêzên me ferz dike. Bi vî rengî wê PDK tevlî vê pêvajoya tunekirinê bibe. Ev plana xetere ya PDK'ê ya li ser Metînayê ji bo me tê wateya îlana şer. Ji ber ku li cihên girîng ên Serê Metîna hêzên me hene. Bidestxistina wê derê tenê bi êrîşê dibe. Ev jî tê wateya destpêkirina pêvajoyeke nû ku qet ne bi dilê me ye.

### Rîsk heye ku şer belav bibe

Ev rewş wê were wê wateyê ku PDK piştgiriya heta niha dide dewleta Tirk bigihîne asteke bilind. Ev jî tê wateya bicihanîna plana dewleta Tirk ku ji berê ve dixwaze û hewl dide şer bike şerê nava Kurdan. Divê were zanîn; tevlîbûna PDK'ê ya bi vî rengî ya li nava şer, yanî êrîşa li ser hêzên me



yên li Metînayê, wê tenê li Metînayê nemîne û wê bê wateya destpêkirina şerekî giştî. Ji ber vê yekê em bang li hêzên siyasî yên xwedî berpirsyarî, rewşenbîr, hunermend û saziyên welatparêz ên Başûrê Kurdistanê, bang li hêzên Kurdistanê hemûyan dikin ku bi berpirsyarî rabin û pêşî li êrîşeke bi vî rengî bigirin.

### Banga li hêzên Kurdistanî: Pêşî li êrîşê bigirin

Ji bo şer nebe şerê nava Kurdan me heta niha di asta herî bilind de berpirsyariyên xwe bi cih anîn. Lê belê eger êrîş li ser hêzên me yên li çeperan bê kirin, hêzên me jî wê xwe biparêzin. Lewma eşkere ye ku pêvajo ber bi asteke gelekî xetere ve diçe. Ji ber vê yekê em bang li gelê xwe û hêzên welatparêz hemûyan dikin ku di vê mijarê de bi erk û berpirsyariya xwe rabin.”

# HPG`ê nasnameyên 2 fermandarên YJA Starê eşkere kirin

**HPG'ê ragihand ku gerîla Destîna Esendere û Rojda Cizîr payîza 2021'ê li herêma Besta şehîd bûne.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê daxuyaniyek da û li ser şehadeta 2 gerîlayan ev agahî bi raya giştî re parve kir:

“Eşkere bû ku hevrêyên me Destîna û Rojda, payîza 2021'ê de li herêma Bestayê di operasyona dijmin de şehîd bûne. Hevrêyên me Destîna û Rojda ku ji bo tola komkujiyên dewleta Tirk a qirker li gelê me kiriye hilîne tevlî nava refên gerîla bûn, bûn mînakên herî baş ên mîlîtaniya Apoyî.

Herdu hevrêyên me weke fermandarên pêşeng ên YJA Starê wezîfeyên xwe yên demê bi rengekî serketî bi cih anîn. Van hevrêyên me yên hêja bi şehadeta xwe jî ferman dan me hevrêyên xwe ku têkoşînê mezintir bikin. Em herdu hevrêyên xwe bi rêzdarî bi bîr tînin û soza xwe dubare dikin ku xeyalên wan ên ji bo Rêbertiya Azad û Kurdistana Azad pêk bînin.

Di serî de malbatên welatparêz ên hêja yên herdu hevrêyên me, em sersaxiyê ji tevahiya gelê Kurdistanê re dixwazin.

Agahiyên li ser nasnameya hevrêyên me yên şehîd bûne wiha ne:

Nasnav: Destîna Esendere
Nav paşnav: Besna Eraslan
Cihê jidayikbûnê: Colemêrg
Dayik-Bav: Baran-Mehmet
Dem û cihê şehadetê: 9'ê Mijdara 2021 / Besta

Nasnav: Rojda Cizîr
Nav paşnav: Mîhrîban Karadûman
Cihê jidayikbûnê: Şirnex
Dayik-Bav: Xezal-Omer
Dem û cihê şehadetê: 9'ê Mijdara 2021'ê / Besta
*ANF*



# Şerê Zap û Avaşîn hunera şer ya gerîla ye

**Hewl didin êrişên dagîrkeriyê yên ser başûrê Kurdistanê bi hemû hovîtiya xwe bidomînin. Operasyona leşkerî ya bi navê 'Pençe Kîlît' ji operasyonekê wêdetir, di çarçoveya şerekî navlênekirî de dewam dike. Ev şer ne pevçûneke 2 artêşên birêkûpêk e, ne jî şerekî klasîk e. Şerekî bêeman yê berxwedanê ye ku komeke gerîla li qadeke teng, li dijî artêşeke mezin ya dewleteke û destekdarên wê tê meşandin.**

ŞUKRU GEDÎK

Ev şerê ku 18'ê Nîsanê dest pê kir, nêzî 2 meh e dewam dike. Dema em li bîlançoya vî şerê 2 mehan dinêrin, gelekî zelal e ku kontrol di destê gerîla de ye. Heke bi vî rengî dewam bike, şerê dawî ye ku artêşa Tirk tê de têk biçe. Dibe ku taybetmendiya herî mezin a vî şerî ew e ku vîna mirovan derdixe holê ku hema bêje sînorên fîzîkî yên mirovan derbas dike. Sînorên mirovan derbas dike. Lûtkeya dilsozî, wêrekî û fedakariyê ye. Îspata wê yekê ye ku ruhekî fedakar têk naçe.

Şerê Zap û Avaşînê ji me re gelek tişt îspat kirin. Îspata şênber a gotina 'teknîka herî mezin mirov e' ye. Di daxuyaniya Fermandariya Biryargeha HPG'ê de hat gotin "Ji ber ku heta niha 6 cure çekên gazên kîmyewî hatine bikaranîn" qelsî û bêçaretiya dijmin radixe pêş çavan. Ji bilî çekên kîmyewî, em ji daxuyaniyên Fermandariya Biryargeha HPG'ê hîn dibin ku tevî bombebaranên hewayî û bejahî jî ku bi şev û roj dewam dikin, encamên têne xwestin li qadên gerîla bi dest nexistine.

Heke hejmara hêzên artêşê yên li dijî gerîla şer dikin, zêdehiya wan a çendanî û çawawnî, cureyê çekên gazên kîmyewî, teknîka modern a gelekî pêşketî, hejmara wesayîtên hewayî û cebilxaneyên hatine xerckirin bên vegotin, dê têkçûna dewleta Tirk belge bike. Hejmara kêm a hêzên gerîla û hejmara bombeyên li her metreçargoşeyeke parçeyekî teng ê Zap û Avaşînê ketine, heta niha gelekî ji şerê Ukraynayê derbas bûne. Ev 2 meh e bi qasî bihostekê jî bi pêş ve neçûye û jixwe îspata têkçûna artêşa Tirk e. Mirov dikare bibêje ku gerîlatiya Apoyî di hunera şer de serdemeke nû vekiriye. Ne pêkan e ku mirov vî şerê ku di her warî de bê hevsengî ye, bi rengekî din vebêje. Mixabin artêşa Tirk a mêtinger a faşîst di vî şerê qirêjî de bi tenê nîn e. Divê hêza NATO'yê ya li pişt wê were dîtin û her wiha divê xiyaneta PDK'ê jî lê were zêdekirin. Artêşa Tirk ku duyemîn artêşa herî mezin a NATO'yê ye, rêxistinên terorê yên wekî DAIŞ'ê jî li envantera xwe zêde kirine û hema hema xwe wek dêwekî dibîne, lê li Zap û Avaşînê li pêşberî gerîlatiyên fedaî yên Apocî têk diçe.



Dîktatorê serkêşê dewleta Tirk a faşîst Erdogan di dijminatiya xwe ya li Kurdan de guh nade tu sînorekî û bi vî awayî hatiye zanîn. Di dema herî qirêjî û lawaz a pêvajoya desthilatdariyê de ye. Ew hewl dide bi aktîfkirina tundiya leşkerî û bi hîsteriya êrişê dibêje 'piştî min dê tofan rabe' û li pey şer dikeve. Bi rewşeke wisa re rû bi rû ye ku dê zirara wê ji kara wê zêdetir be. Hewldana wî ya şer a li Zap-Avaşînê dê bibe şerê wî yê dawîn. Tevî hemû teknîkên modern ên pêşketî yên şerê leşkeri û her cure taktîkan jî encam bi dest nexistin.

Aliyekî din ê vî şerî jî, şerê piralî yê psîkolojîk e. Tevî hemû propagandayên reş jî şefê AKP'ê mecbûr ma rastiya şer qebûl bike. Dema ku cenazeyên leşkeran çûn, got "Şehîdên me hene, lê yên gerîla gelekî zêdetir in" û hewl dide xwe rehet bike. Lê belê, heke windahiyên gerîla ew qas bûna, dê pir bi rehetî biketana Zap û Avaşînê. Çi zû çi jî dereng, dê hîn bibin ku bi nixumandina derewan, xapandina gel û veşartina cenazeyên leşkeran nagihêjin tu encamekê.

Wek fermandarê giştî yê artêşê ku li Zap û Avaşînê li dijî gerîla têk çû, Erdoganê dîktator ku ji bilî lixwekirina cil û bergên leşkerî xwedî tu merîfeteke din nîn e û niha jî çav berdaye gelê sivîl ê Rojava. Erdoganê dîktator îro wek Dehaqê nûjen ê gelê Kurd e. Goştê mirovan dixwe, xwînawan vedixwe. Di şerê navxweyî yê Sûriyê de bûye sebebê jiyana bi milyonan mirovan. Bi milyonan mirov bê cih û war kirine. Îşkence, destavêtin,




revandina mirovan, fîdye, rêbazên dermirovî, bûne wesîle ji bo dewamkirina desthilatdariya xwe.

Desthilata Erdogan a ku hewl dide vegere serdemên tarî, êdî dawî lê tê. Êdî ne mimkûn e ku li ser desthilatê bimîne. Çi komployan dike bila bike, kîjan taktîkan bi kar tîne bila bike, li ku derê êriş dike bila bike, dê nekare ji aqûbeta xwe û nifirin gelê Kurdistanê û xezeba gerîla xelas bibe.

Gefên êrişê yên li ser Rojava ne nû ne. Hewldana wan a ji bo dagirkirinê heta 30 km'yan, dibe ku sefera dawîn a li ser Rojava be ku ji bo wan jî mirin e. Heke çav berde mal, milk û namûsa gel û Rojava dagir bike, helbet dê gel jî di cihê xwe de nesekine. Hewl didin kula xwe ya li Zap û Avaşînê, li Rojava derman bikin, lê ev hesabê wan şaş e. Jixwe daxuyaniyên rayedarên YPG, YPJ û QSD'ê yên "berdêl wê gelekî giran be" ji raya giştî re hatibûn ragihandin. Rayedarên Rojava û nûnerên Rêveberiya Xweser ji berê de diyar kiribûn ku ew ê "li dijî her cure êrişan amade ne." Xuya ye li Rojava surprîzên nû ji wê artêşê re hene ku îradeya wê li Zapê şikestiye.

***ANHA***

## Serkeftina me têkçûna projeyên wan e!



Dilyar Cizîrî

Di sedsala 21'ê de pêşketina teknîkî ya mirovan cîhan piçûk kiriye, ji lewra êdî bandora hemû deveran bi şêwayekî ji şêwayan li ser hev dike. Ev jî bi êrişa Rûsya ya li ser Ukrayna diyar dibe. Dema Rûsya dest bi êrişa xwe ya li dijî Ukraniya kir, Ewropa jî di nav de yekser bandora aborî li gelek welatên cîhanê kir.

Ev bandor di aliyê xwe yê aborî tenê ve sînordar nema, di aliyê siyasî de jî gelek guhertinên berbiçav çêbûn û hê jî çêdibin. Êdî sîstema cîhanê ya yekalî ku bi hilweşîna Yekîtiya Sovyêtan re destpê kiribû, bi dawî dibe. Çiqas piçûk be jî her welatek dixwaze ji bo berjewendiyên xwe sûdê ji vê rewşê bigire.

Ji aliyan zêdetir jî dewleta Tirkan û serokê wê Erdogan ketiye nava liv û tevgerê. Ji aliyekî ve xwe xistiye wekî navbênkar di navbera Rûsya û Ûkrayna û ji aliyê din ve jî milê xwe daye ser NATO û bi wan re jî bazaran dike. Di vê de jî destê xwe ne bi temamî dide aliyê Rûsya û ne jî bi NATO re ne birêkûpêk tev digere. Armanca hikûmeta Tirkan û serokê wê Erdogan ew e beriya hilbijartinan karibe di nava vê rewşê de bi qezencek derkeve û berê girseya Tirk di hilbijartinan de bîne aliyê xwe.

Ji wê jî pêk bîne, dibînin pêwîstiya wan pê heye, di yek ji qadên Kurdistanê de qezenekê bi dest bixin. Gava wan a yekê herêmên Parastinê yên Medya û hêzên gêrîla bû. Sala derbasbûyî 23'yê Nîsanê êrişî herêmên gêrîla yên Başûrê Kurdistanê kirin. Bi sedan car çekên kîmyawî bi kar anîn, lê nikarîbûn vîna gêrîla têk bibin. Îsal jî ji 17'ê Nîsanê ve êrişî gêrîla dikin, lê nikarin îradeya gêrîla bişkînin.

Berûvajî, ragîhandina HPG'ê ji qadê parve dike, rojane derbên giran li Artêşa Tirk dikevin. Li Bakur jî siyaset tecrîdê him li Imralî û him li dijî HDP'ê zêde kirine. Lê tekoşîna Bakurê Kurdistanê û berxwedana li wir planên wan bêencam dike. Erdogan ji lewra bi xurtî berê xwe daye Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dixwaze QSD'ê û Rêveberiya Xweser ên li dijî projeya wan a Mîsaqa Milî bûne mertal, bêbandor bikin.

Wer xuya dike gefên Erdogan ên têne kirin wê her dewam bikin. Erdogan ji bo armanca xwe ya pêkanîna êrişekî li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, wê her tiştê di destê xwe bi kar bîne. Wê di hevdîtina bi wezîrê Rûsya re jî hemû kartên di destê xwe de bi kar bîne. Li ser van esasan jî ihtîmala êrişeke li dijî herêmê heye. Îcar pêwîst e li ser vî esasî hemû gelê herêmê bi hemû pêkhateyên xwe amadekariyên xwe yên mezin pêk bînin. Divê hemû gelê herêmê xwe li gorî rewşa şer serferber be.

Em di vir de jî dikarin gotina Serokê Navenda Çavdêriya Sûriyê ya Mafê Mirovan Ramî Ebdulrehman a dibêje ji bo Erdogan niha gundekî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir bike, qezencekî mezin e. Rast e heta niha çira kesin bi dest ne xistiye, lê her pêwîstî pê heye, em rewşa heyî di ber çavan re derbas bikin û li gorî wê rewşê amadekariyê bikin. Pêwîst e em ti carî ji bîr nekin, serkeftina me bi têkçûna projeyên Erdgoan ên guhertina demogafî û planên dagirkeriyê re derbas dibin.



# Êrişên dagîrkeriya tirkî li ser tevayiya gelên herêmê xeter in

## Ehmed Yildirim: Bi êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê wê aramiya herêmê têk biçe, kirîza Sûriyê kûrtir bibe û çeteyên DAIŞê jinûve xwe xurt bikin.

Mihemed Xanim-Qamişlo

Di nava bêdengiya cîhanê de, dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên girêdayî wê, gefên xwe li ser bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dikin. Bi êriş û şerên taybet dixwazin herêmê ji gelên wê yên resen vala bikin. Bi armanca têkbirina projeya Biratiya Gelan, dewleta tirkî ya dagîrker bi hêzên navneteweyeyî û herêmî re di nava tevgeran de ye. Bi bazarên xwe yên qirêj dixwaze gelên herêmê ji azadiyê dûr bixe.

Li ser vê mijarê Doç. Dr. Ehmed Yildirim ji me re axivî. Yildirim diyar kir ku bingehê amadekariya êrişên dewleta tirkî ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê berî 10 salan hatiyê danîn û axaftina xwe wiha domand "Bihara Ereban bi serhildanekê li Tûnsê dest pê kir û li gelek welatên Ereban belav bû. Herî dawî li Sûriyê çirûska şoreşê pê ket û serhidanan dest pê kir. Van serhildanan ji bo gelan tiştekî erênî pêş nexistin. Lewra van serhidanan ji pêsîra xwe DAIŞ û çeteyên radîkal derxistin. Li vir di serhidanan de du bask hene, baskek azadîxwaz e, baskê din jî DAIŞ û dilxwazên wê ne."

### Tirkiye di warê siyasî, civakî û aborî de qels bûye

Yildirim bal kişand ser hevkariya hêzên navneteweyeyî bi dagîrkeriya tirkî re û wiha axivî: "Gef û êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê girêdayî siyaseta berî sedê salan e ku li Rojhilata Navî li dijî kurdan bi awayekî rêkûpêk tê meşandin. Ne hikumeta AKPê tenê vê siyasetê dimeşîne. Gelek dewlet bi Tirkiyê re alîkar in û piştgiriya êrişan dikin. AKP dixwaze parastina hikumeteke nijdprerest pêş bixe. Herwiha dixwaze rewşa awarte bide pêş û hêza leşkerî bixe tevgerê. Desteya Ewleyiyê ya tirkî berî demekê civiya, derheqê bakur û rojhilatê Sûriyê de biryara êrişên nû da. Desteya ewleyiyê piraniya wê ji leşkeran pêk tê û cihê pêkanîna planên dewletê ye."

Yildirim da zanî ku niha dewleta tirkî dixwaze ji cîhanê tevê sûdê bigire û wiha axivî: "Tirkiye ji nakokiyên navbera hêzên cîhanî de sûdê digire. Dixwaze ji şerê Rûsya û Ukrayna hin tiştan qezenc bike. Armanca wê ya yekê dagîrkirina herêmên Kurdan e. Herwiha ji bo erêkirina tevlîbûna Swêd û Fînlandiya ya Nato, daxwaziya qirkirina Kurdan dike."


### Hesabê Rûsya û hikometa şamê şaş E, armanca Tirkiyê wêrankirina Sûriyê ye

Ehmed Yildirim diyar kir ku rêjIma Şamê bi serê xwe nikare biryarekê bide û axafina xwe wiha qedand: "Hikumeta Şamê bê Rûsya û Îranê nikare polîtîka xwe diyar bike û helwestekê nişan bike. Piştî şkandina DAIŞ û komên radîkal, Şam bi alîkariya Rûsya û Îranê hin dever vegerandin. Dema niha berjewndiyên Şamê û Rûsya ji hev cuda ne. Herwiha berjewendiyên Îran û Rûsya jî li Sûriyê ji hev cudan e. Hikumeta Şamê naxwaze Kurd bibin xwedîhêz û ji bo wê peymanan bi Tirkiyê re imze dike. Heta 2014an, Tirkiyê dixwest bajarên Sûriyê yên sereke weke Şam, Heleb û Latikiyê wêran bike û xuya ye



ku rêjima Sûriyê ev tişt ji bîr kiriye. Rêjima Sûriyê dixwaze Kurd vegerin berî şoreşê û îradeya xwe radestî Şamê bikin. Kurdan gelek berdêl dan, 12 sal in êş û azarê dikişînin. Bi têkoşîna xwe gelên herêmê parastin. Di dawiyê de wê rêjima Sûriyê mecbûr bibe bi Kurdan re li ser maseyekê rûne. Lewra jêderên enerjiyê di destê Kurdan de ne û rêjim di milê aborî de xeniqiye."

## Dema dersdayîna dagîrker û qirkeran e.



Zekî BEDRAN

Rêveberiya faşîst ya Tirkiyê plana êrişa ser Sûriyê çêkiriye. Ev êriş di demên guncaw de û parçe parçe dibin. Egereke Tirkiyê ya heq û rewa nîne. Yek ji hêzên Sûriye xistîn gêrava bixwîn û berpirsên xwîna hatî rijandin û roxînê Tirkiye bixwe ye. Li Sûriyê dema tevlîheiyê dest pê kir di cî de ketin tevgerê. Gotin, berî niha me li bakurê Iraqê şaşîtî kir em li Sûriyê heman şaşîtiyê nakin. Mebesta wan ji vê li başûrê Kurdistanê bidestxistina Kurdan ya statûyê bû. Gotin wê demê em bi Amerîka re tevlî şer nebûn, ji ber wê em ji derve man û Kurdan statû bi dest xist. Vê carê em dest werdin da Kurd tiştekî bi dest nexin.

Erdoganê faşîst li rex dijminiya Kurdan xwest Bihara Ereban bike bihara Ixwaniyan. Hizirî ku wê bi rêbertiya Ixwaniyan li Rojhilata Navî desthilatdariya xwe xurt bike. Digot, çawa be li Rojhilata Navî rejim diroxin. Yên bi rêxistin û bibandor Ixwanîne. Em wan biparêzin û pêşengiyê ji wan re bikin di alema islamê de payeya serokatiyê ji min re bimîne. Bi vî awayî wê Rojhilata Navî ji bermayiyê Osmaniyan re bima. Wê heta bixwaze petrol bi des bixista û çawa bixwesta hespê xwe bibezanda. Hem wê ji Kurdan rizgar bibûya hem wê bibûya xelîfe. Li Tirkiyê jî wê bê astengî dîktatoriya xwe ava bikira.

Lê çawa hesab dikir Sûriyê di jî de neket. Ixwanî jî li Rojhilata Navî nebûn hêza serdest. Sûriye bi roxîneke giran re rûbirû ma. Ji ber têkoşîna li hemberî DAIŞ'ê hêzên dinyayê yên mezin jî ketin Sûriyê.
Tirkiyê ev kir firset û bi artêşa xwe di dawiyê de dest bi dagîrkeriyê kir. Di hedefa Tirkiyê de Kurd hebûn. Çileya 2018an bi lihekirina bi Rûsya re Efrîn dagîr kir, Cotmeha 2019an jî bi lihekirina bi Amerîka re Girê Spî û Serê Kaniyê dagîr kirin. Herêmên dagîr kirîn li Sûriyê herêmên herî ewle û demokratîk bûn. Li seranserê dinyayê jî li ser dawîkirina şer û peydakirina riyeke çareseriyê ya siyas lihevkirin hebû. Lê Tirkiyê e tev avêtin aliyekî û bi zordariyeke mezin êrişî herêmên Kurd lê dijîn kir û qirkirina etnîkî kir. Mafên Sûriyê yên serweriya dan aliyekî û dest bi amadekariya dagîrkirinê kir.
Dewleta tirkî ya faşîst dixwaze ji Efrîn heta Dêrikê deverên Kurd lê dijîn ji serekî heta serê din dagîr bike. Erdogan ev bê ku pakiyê ji ti kesî bike li NY ragihand. Dibêje ezê bi kûrayiya sî km bikim qaşo herêmên ewle û bi milyonan Ereban ji derve bînim li wan herêman bi cî bikim. Ji bo pêkanîna vê planê bi awayekî eşkere dibêje min amadekariya êrişan kiriye. Erdogan dibêje, kî çi dibêje bila bêje ev harêm herêmên min yên ewleyiyê ne û tişta min gotî ezê bikim. Ango erdê dewleteke din ji bo xwe dike herêma ewle.

Erdogan dixwaze şerê Ukrayna ji xwe re bike firset. Dibêje çawa be Rûsya di tengiyê de ye, muhtacê min e û wê tawîzê bide min. Amerîka û NATO jî min navêjin wê çavê xwe ji min re bigirin. Jixwe Amerîka û Ewropa, dixwazin Swêd û Îskandînavya bixin nava NATO. Ezê hinekî nerihetiyê çêkim Kurdan bixim bazarê û ji bo dagîrkeriyê destûra wan bigirim. Dibêje, çawa be derdê van dewletan berjewendiyên wan in, ti kes ji bo Kurdan xwe naxe tengayiyê. Di vî fikrê xwe de ne neheq e jî. Lewre berî niha ev ceribandiye û Efrîn û Serê Kaniyê dagîr kirine.

Dinya tev dizane ku Tirkiye li Efrîn û Serê Kaniyê qirkirina siyasî dike. Di vê mijarê de rapor hane. Çeteyên di emrê Tirkiye de sûcên kirîn di ragihandinê de didin. Digel wê li hemberî van sûcan helwestek nehat nîşandan. Tirkiyê jî ji vê cesaret girt ji bo dagîrkirinê behaneyên xwe domandin. Qaşo ji herêmên xweser êrişî sînorên Tirkiyê tê kirin. Halbiku heta niha ji bakur-rojhilatê Sûriyê êrişek jî li hemberî Tirkiyê nebûy. Tersê wê her tim dewleta tirkî êriş kiriye. Heta niha Tirkiyê û çeteyên wê li herêmên sînor bi sedan sivîl kuştine.

Dewletatirkî li herêmên dagîrkirê DAIŞ û El Nusra bi rêxistin kirine û bi kar anîne. Ev hem ji bo herêmê hem ji bo dinyayê xetereke mezin e. Ev çete ji Libya heta Azerbaycanê dane şerkirin. Amerîka û NATO her tim dibêjin em fikarên dewleta tirkî yên ewleyiyê li ber çavan bigirin. Lê Kurd û dinya di binê gefeke mezin de ne. Ji bo vê ti kes tiştekî nabêje. Hêzên Sûriyên yên welatperwer û demokratîk mafê wan yê berxwedan û parastine erdê wan heye. Ji bo wê divê bêdudilî amadekariya xwe bikin. Wê sûriyekî Sûriyê biparêzin. Divê dersa dagîrker, çete û bikujan bê dayîn.